



**NOW!**  
Nicht Ohne das Wir

**NOW! Ne Bêyê Me:  
Xweparêziya Penaberên Astengdar**



## Tevlî me bibin!

Koma me ya „**NOW! Nicht Ohne das Wir**“  
kêfxweş e ji ber endamên nû û pêşwazî ji we re dike.  
Tu penaberekî astengdar î yan jî endamekî  
malbatê yî ku li Almanyayê dijî? Piştî em  
bêsebir li bendê ne ku te nas bikin û te vexwînin  
ku beşdarî koma me bibî. Li gel me dengê te tê  
bihîstin û tecrubeyên te bi nirx in.

**Werin em bi hev ra bixebitin da ku em ji bo  
her kesî pêşerojê berfirehtir biafirînin!**

## EM KÎ NE Û EM BI ÇI VE GIRÊDAYÎ NE?

Em komeke xweparêz a penaberên astengdar û xizm û malbatên wan in. Xweparastin tê vê wateyê: Em bi xwe nûnertiya berjewendiyên xwe dikin, di siyaset, rêveberî û civakê de xwedî li mafên xwe derdikevin. Armanceke me ya hevpar heye: **Em dixwazin şert û mercên jiyane yê penaberên astengdar û xizm û malbatên wan ên li Almanyayê baştir bikin.**

Em ji welatên cuda tên, bi zimanên cuda diaxivin, xwedî serhatiyên takekesî ne û jêhatîbûn, zanebûn û ezmûnên gelekî cuda bi xwe re tînin. Em cihêreng in. Û cihêrengiya me, me xurt dike!

## EM Ê ÇAWA LI BERJEWENDIYÊN XWE XWEDÎ DERDIKEVIN?

- Em li bajarên cuda yê Almanyayê dijîn. Ji ber vê yekê, civînên me yê komê yê mehane li ser înternetê pêk tên. Em salê herî kêr carekê li Berlînê bi şexsekî re tên cem hev. Di civînên xwe de em li ser mijarên ku ji bo me girîng in, diaxivin. Em çalakiyan plan dikin û pisporan li ser mijarên cûda vedixwînin.
- Em bi siyasetmedaran re hevdiîtin çê dikin. Di hevdiîtinan de em li maf û berjewendiyên xwe xwedî derdikevin.
- Em piştgirîya Handicap International e.V dikin di pêşxistina materyalên agahdariyê yê pirzimanî de ji bo alîkarîya penaberên din ên kêmendamiyê bi rêya parvekirina ezmûn û zanîna xwe.
- Em ji bo ku ji hev fêr bibin, bi kom, komele û rêxistinên din re ramanan diguherînin.
- Ji bo ku em zaniyarîyên xwe di warê revîn û astengdariyê de berfirehtir bikin û bikaribin mafê xwe hîn baştir bixwazin, em di kursên perwerdeyê de beşdar dibin.

# Ma hûn dixwazin me nas bikin û bêtir li ser Koma me bizanin?

BI VÎ AWAYÎ TU DIKARÎ TÊKILIYÊ BI ME RE DEYNÎ:



**Omar Ahmad**  
Rêveberê karê Civakî

@ ok.ahmad@hi.org  
+49 (0) 30 28043928  
+49 (0) 152 05955521



Koma xweparastinê “NOW! Nicht Ohne das Wir” tê piştgirî kirin Handicap International e.V. di çarçoveya projeyê de “Empowerment Now”.

**NOW!**  
Nicht Ohne das Wir



Xebata xweparastinê ya koma  
“Now! Nicht Ohne das Wir” ji hêla:

